

Alîkariya aborî

Agahî ji belediya Tranâsê



TRANÅS KOMMUN
SOCIALTJÄNSTEN

Mafê kî yê alîkariya aborî heye?

Li gorî qanûna Xizmeta Civakî, mafê piştgiriya xwedîkirinê tê biryar dan. Îmkana te heye ku tu daxwaza piştgiriya xwedîkirinê bikî heger tu yan jî malbata te ji heqê aborîyê dernekevin. Alîkarî li gorî pêwîstiyê ye û divê tu hemû tiştî bikî ji bo ku tu bi xwe ji heqê xwedîkirina xwe derbikewî, bi rêya dahatên kar yan jî alîkariyên giştî, ji bo nimûme yên weka pereyê nexweşiyê, kaseya bêkariyê, alîkariya kirê, alîkariya zarokan û piştgiriya nefeqeyê.

Dêûbav weka erkdarê xwedîkirina zarokên xwe têne dîtin hetanî zarok 18 salên xwe temam dikin yan jî xwendengeha amadeyî diqedînin lê herî dereng hetanî dibin 21 salî.

Berî ku mafê te yê alîkariya aborî çêbibe divê mal (pereyên di bankê de, hise û tiştên din) yan jî malê serfkariyê yê xweragir (malên mîna otomobîl, televîzyon, makîneyên malê û hwd) ku mirov bi hêsanî dikare bifroşe bêne bi kar anîn. Malûmilkê neguhêzbar û otomobila meriv, ew mal in kû ew jî dikarin tesîre li ser mafê alîkariya aborî bikin.

Alîkariya aborî ne bêşert e.

Prensîpeka girîng di qanûna xizmeta civakî de ew e ku her mirovek di destê yekem de xwedîyê berpirsiyarîya jiyana xwe ye û bi vê yekê jî dikare daxwaza şertan ji te bê kirin. Divê tu di xizmeta bazara kar de bî heger tu bêkarî.

Ew tê mana ku divê tu li Daîreya Kar qeyd kirîbî û aktîv li kar bigerî û pêşniyazên ji bo kar û tedbîran qebûl bikî. Heger na, tu nikarî hesab bikî ku tu dê alîkariya aborî werbigirî.

Xizmeta Civakî dikare ji te daxwaza beşdarbûna çalakiyên praktîk û bilindkirina kompetensê bike. Alîkariya aborî dikare neyê pejirandin yan jî bê kêr kirin heger tu pêşniyazên wusa red bikî.

Heger tu ji ber nexweşîne nikarî kar bikî, divê tu bikaribî bi rapora doktor îspat bikî.

Alîkariya aborî tê çi maneyê?

Li gorî beşa 4an, benda 1ê ya qanûna Xizmeta Civakî divê alîkarî garantiya sewiya jiyaneke beraqil bike. Alîkarî divê formekî bigre ku imkanên te yên ji bo jiyaneke serbixwe xurt bibin. Alîkariya aborî hem ji piştgiriya xwedîkirinê û hem jî ji "alîkariya awayê jiyana te ji derveyî vê" pêk tê.



Piştgiriya xwedîkirinê bi du beşan hatiye dabeş kirin. Hukumet her sal biryara, ku jê re dibêjin, qaîdeyeka giştî dide. Sewiye li ser bingehe lêkolîna bihayên resmî ava dibe. Qaîdeya giştî dê têra van mesrefan bike:

- » xwarin
- » kinc û pêlav
- » lîstîk û dema vala
- » tiştên bikaranînê
- » laşsaxî û paqijî
- » rojnameya rojane, telefon û xerca TV

Ji derveyî van, mafê te ji bo hinek mesrefên din yê jiyane jî heye, bi şertê ku ew maqûl bin. Ji bo nimûne mesrefên wusa:

- » hêwirîn
- » elektrîka malê
- » gera bi minasebeta kar
- » sîgorteya malê
- » xerca sendîka û kaseya bêkariyê

Dikare mafê te ji bo alîkariya awayê jiyana te ji derveyî vê jî hebe. Ev ji bo mesrefên ku dikevin nav alîkariya garantiya sewiya jiyaneka beraqil lê ku ewqas zedê rû nade. Ji bo nimûne, ew mesref ev in:

- » tiştên nav malê
- » lînerîna doktoran/derman
- » lînerîna diranan



Lêkolîn

Gava tu daxwaza alîkariya aborî diki herî pêşî lêkolîneka esasi tê kirin. Pewîstiya te ya hesabkirî bi dahata te re tê miqayese kirin. Divê tu loma bikaribi hemû dahatên xwe û mesrefên ku nakevin nav qaiîdeya giştî îspat bikî.

Ev ji bo endamên din yê malbatê jî derbas dibe heger ku malbata te hebe. Heger ku agahiyên ne rast bêne dayîn, ev dikare bibe sebebê giliyê li ba polîsan.

Mafê Xizmeta Civakî heye ku hinek agahiyan ji Kaseya Sîgorteyê, Daîreya Teqawidiyê, Daîreya Bacê, Komîsyona Navendî ya Piştgirîya Xwendinê, Daîreya Kar û kasêyên bêkariyê werbigire. (beşê 11 benda 11 § Qanûna Xizmeta Civakî).

Mafê te herdem heye ku tu ji lêkolîn û ew notgirtinên dosyeyê agahdar bî. Mafe te jî heye ku tu beyî notgirtin heger tu bawer dikî ku tiştêk şaş e.

Biryar

Biryar wek qaîde ji aliyê ew dabaşnêrê ku li ser daxwaza te lêkolîn dike vê tê dayîn. Dema lêhûrnêrîne hetanî 10 rojan e bi şertê ku hemû belgeyên hatine xwestin teslîm bûbin.

Heger tu ji biryarê ne razî bî

Du dikarî îfîraz bikî heger ku te reda daxwaza xwe wergirtibe. Ji we roja ku tu ji biryarê agahdar dibî û 3 hefte peş ve tu dikarî îfîraza xwe bikî. Îfîraz teslîmî Xizmeta Civakî dibe. Dabaşnêrê te herdem dikare alîkariya te bike heger ku tu ji bo îfîrazkirinê zahmetî bikşînî.

Peredan

Alîkariya aborî normal bi rêya hesabê bankê, postcîro, bankcîro yan jî bi awayekî wusa tê dayîn. Wek qaîde peredan rojeka kar dikşîne.

Nihênîgirtin û sonda sirveşartinê

Alîkariya aborî wergirtin û qeyda teya li ba Xizmeta Civakî nihênîkiriye. Hemû kesên ku di Xizmeta Civakî de kar dikin xwedî sonda sirveşartinê ne û nikarin bê riza te agahiyên di derheqê te de bidin kesên bêdesthilat.

Butçe û deynsererastkirin

Butçe û deynsererastkirin dikare bê pêşkêş kirin. Bi pêşwext, demeka ji bo serdanê bi rêya sentralê li belediya Eksjö veqetîne.

Telefon 0381-360 00.

Navnîşana serdanê: Avahiya belediya Eksjö li Södra Kyrkogatan 4, 575 80 Eksjö.



Têkilî

Recepsiyon Xizmeta Civakî Telefon 0140-681 36 e-name:
socialtjansten@tranås.se

Navnîşana serdanê: Storgatan 22, deriyê di ber kitêbxanê de
Resepsiyon di rojên kar de vekiriye

Saet: 8:30-12:00 û saet: 13:00-15:30

Di rojên kar de digîjî Sekreterê Civakî saet: 8:30-9:30, telefon 0140-681
36.

Bi rêya sentrala belediya Tranåsê jî dikari bigîjî Xizmet Civakî telefon
0140-681 00

Daxwaza nû:

Rojên kar saet: 8:30-9:30, telefon 0140-686 80.

Navnîşana posteyê

Tranås kommun
Socialtjänsten
Individ- och familjeomsorgen
573 82 Tranås

Informationen i denna folder gäller fr.o.m. 2015-01-01



TRANÅS KOMMUN
SOCIALTJÄNSTEN